Hevpeyivîneke Berfireh
bi Selah Bedredîn re

despêk
rêbaza Çepê neteweyî
rûbirûbûneya rêjîmê-opozisyon
rola Barzanîzim-Lêgaletî
asoyên tevgera rizgarîxawza Kurdistanî

Beşê Yekem

Hevpeyivînek bi mamoste Selah Bedredîn re

Nivîskar û siyasetmedarê Kurd mamoste Selah Bedredîn, ne hewceyî danasîn û pêşkêşkirinê ye , di vê dema dawî de pir axaftin û guftûgo derbarê wî de çêbû , û pir nivîs li serê hatine nivîsandin di navbera alîgir û rexnegir de bi taybetî piştî beşdariya wî ya aktîv û giring di Eniya Felata Niştimanî de bi birrêz Ebdilhelîm Xeddam û girûpa Ixwana Misilmîn – Birayên Misilman- li Sûriyê re . Me hevpeyivîn pê re çêkir û me xwest ku ew pirsgirêkên heyî zelal bike û bersiva pirsên gelek yên girêdayî bi mijarên tavil ve , yên niştimanî Sûrî û netewî Kurdî ,bide .Ev e deqê hevpeyivînê .

Hevpeyivîna : Besam Mistefa û Dr.Ridwan Elî

Hewlêr –Kurdistana Iraqê 27/6/2006

- **Mamoste Selah Bedredîn , hun beşdarî konfiransa Waşîntonê ya ku berî demekê lidarket bûn , û duvre hun neçûn civîna Birokselê , gelo ji ber çi sedeman we ev biryar sitend ?**

- Rast e , sebaretî Konferansa Waşîntonê em hatine vexwendin ji bo beşdarîkirinê di civîna Kurdên Emerîka û Kenedayê de bi armanca ku ew xwe organîze bikin û rêxistinekê ji xwe re damizrînin. Piştî gihiştina me û di roja yekemîn ya Konferansê de diyar bû ku hin armancên dîtir hene tevî ku ne zelal bûn bi rengekî hûr , lê me hestkir ku mesele ji rastiya xwe ya pêşîn û resen dûr dikeve, û me hindek nîşan bihîstin ku hinek kes hene dixwazin kongirekî netewî ji bo Kurdên Sûriyê ,girêbidin ! Vî tiştê ku em matmayî hiştin ji ber ku amadekirinên pêwîst tunebûn û nûnerên tavilê şepêlên konevanî û hizbî û rêxistinî yên Kurdistana Sûriyê beşdar nebûbûn ...ev pir seyr bû bi rastî tevî amadebûna kesayetiyên naskirî bi dijminahiya xwe ji partî û rêxistinên Kurdî re ji demaka dûrûdirêj ve . Li hember vê yekê me ji despêkê de daxuya kirin ku em hatine vî konferansî li ser bingeha ku civînek heye ji bo birêxistina refên Kurdên Emerîka Bakur û Keneda ,û ji nişkêve di dema girêdana konferansê de pêşniyazên nû hatine meydanê . Herweha me eşkere kir ku xêzeke sor heye girêdayî bi hebûna tevgera siyasî ya Kurd li hundirû û nabe bête derbskirin û me vekirî got ku ev tişt nabe û em dê nehêlin tevgera netewî Kurd were derbaskirin û bipaşguhxistin , ev tevgera ku zêdeyî

nîvsedsalekê ye xebatê dike tevî hemî têbîniyên me derbarê siyaset û nêrînên hinek serkirdayetiyên partiyên me . Ev destnîşaniya me weke nameyekê bû ji tevahiya beşdaran re , û bi rastî jî gelekan ji amadebûyan nêrînên xwe di vî warî de derbirrîn û pêşniyaza min ciyê piştgirî û palpiştiyê bû ji layê wan ve . Ji bo amadebûna min jî , piştî ku min ev mesele hestkir û ev hewildan dîtin , min biryar girt ku ez berdewam bikim û tiştê li nik xwe pêşkêş bikim ji bo ku konferans biser bikeve ji ber ku mesele hatibû ilankirin û bipaşve vegerîn hew dibû nexasime ku beşek ji civînê wê roja din li yekê ji holên Kongirêsê Emrîkî de lidar biketa , û ez bi yên din re mam û min hewil kir heta ji min hat da ku civîn bi ser bikeve di çarçoveya armanca ku ew ji bo wê hatibû girêdan , û bi rastî jî min hevpişkiya yên din kir di formkirina beyannameya kotahiyê û biryar û pêşniyar û perensîpên giştî yên ku dikarin bêne pêşkêşkirin wekû nêrîneke siyasî di roja din de , û ev tişt çêbû jî , û di roja din de jî min bi aktîviyane beşdarî kir dema ku min rûniştina ku hindek partiyên opozisyona Erebî Sûrî tê de cîgirtin , birêvebir . Min bi rengekî şayiste bi wan re guftûgo û danûsitandin kir û reakisyonên wan erênî bûn derbarê kêşeya netewî Kurdî li Sûriyê .

Sebaret bi civîna Birokselê jî , bi rastî ez beşdar nebûm û min nêrîna xwe bi eşkere û vekirî ilan kir berî girêdana wê bi demekê ji ber gelek sedeman , sedemê yekem ku yê ku ev civîn birêvebir yaxud jê re bû rêber eynî ew kesê ku beşdarî, tevlî xeynî xwe, di konfiransa Waşîntonê de kiribû û ji ber arezû û meyildariyên xwe yên kesîtî herdû kesên ku rola sereke di konfiransê Waşîntonê de lîstin

dûrxsitin ku yek ji wan mirovê wî bû ..Tevî ku ti biryar li Waşîntonê , ne di herdû rûniştinên fermî û nejî di beyannameya kotahiyê de ti bend tunebûn ku vexwendina girêdana kongirekê netewî yaxud niştimanî ji bo Kurdên Sûriyê dike di demeka nêzîk de ! Sedemê din jî ku pêşniyazên konfiransa Waşîntonê hatine sextekirin ji ber ku 13 xal hene û ew hêjî li nik min in bi xêzên destê min hatine nivîsandin ji ber ku min forma xwe pêşkêşkir û bi piştigirî û pijrandinê hate pêşwazîkirin û bi gelek zimanan hate belav kirin . Dîsa ez dibêjim ku ti bend tune bûn ku banga girêdana kongirekî netewî yan nitşimanî dike lê bendek hebû ku banga hevgirtina tevgera Kurdî li Sûriyê dike û hewildana gihştina , di riya arîkariyê bi tevgera Kurdî ya siyasî li hundirû , yekkirina tevgera Kurdî di riya girêdna kongiran yan çi tiştê dîtir , û tiştê ku li Biroksilê rûda ya herî dûr bû ji vê mijarê ji ber ku tevgera Kurdî ya siyasî li hundirû bi yek nûnerî beşdarî tê de nekir û dûrketineka berfireh û tewaw ji layê tevahiya partî û rêxistinên Kurdî ji civîna Biroksilê re çêbû . Sedemê sisêyan ku civîna navbirî ji ber kêm amadeyiyê û lez û bezê û hewildana hindekan ji bo bicihanîna armancên kesane bandoreka xwe ya negatîv li tevgera Kurdî li Sûriyê kir û ziyan gihande doza Kurdî bi behaneye ku berî û di nav û piştî wê de 4 rêxistinên nû hatine damizrandin !! bi navê partî û rêxistinan tevî ku endamên hineka ji wan ser tiliyan têne jimartin lê dîsa eveya karekî xirap e , ji xwe re biram in eger ku civîn dixwaze kongirekî neteweyî yan nitşimanî lidar bixe û banga yekkirina tevgera Kurd dike , vêce çawa sozan dide û germ dike !! ji bo

berzkirina navên rêxistinî yên nû nexasime ku hindek ji wan guman û sawîr li dora wan diçin û tên , ji ber hindê ku hestbûn û nêrîna min di cihê xwe de bûn , ji ber ku min hest kir ku ew civîn û bi rengê ku hate lidarxistin wê ziyanê bighîne doza milletê me û kêşeya yekkirina tevgera me ya siyasî û ji ber vê min beşdarî tê de nekir û gelekên dîtir jî her wisa kirin ji partî û rêxistin û kesayetiyên rewşenbîr û ramyarî ser bi Rojavayê Kurdistanê û ne rast e tiştê hindek kes ilan dikin ku nebeşdariya min di wê civînê de hişt ez vê nêrînê bigirim , ez li vir dipirsim gelo ez di civînên din de weke yên ku li Parîsê û Siwêdê û Holenda û Berlînê lidar ketin beşdar bûme ..û duvre nêrîneka baş ji wan girtiye û berpirsên wan pîroz kiriye bê ku ez hinekan ji wan di warê kesîtî de nas bikim ?.

-Pirsa me ya didwan girêdayî Eniya Felata Niştimanî li Sûriyê ye , nûnerî û beşdariya Kurdan çawa bû û nêrîna partiyên Kurdî li Sûriyê derbarê Eniyê û tevlîbûna wê çi ye , bi taybetî ji ber ku hun herdem giringiya hundirû berz dinirxînin weke ku we niha got ?

- Helbet , Eniya Felata Niştimanî li Sûriyê , nûneriya pêkhatiyên ji opozisyona niştimanî ya demokrat li Sûriyê dike , nexasime yên ku hebûna wan li hindir û derve heye . Bê guman , pêkhatiyên bingehînî di Eniya Felata Niştimanî de ji Be'esiyên ku li dij rêjîmê û tevgera Birayên Misilman (Ixwan) û ji hinek şepêlên lîberal û netewî û ji aliyê Kurdî pêktê. Diyar e ku opozisyona niştimanî Sûrî bi baskên xwe yên Kurd û Ereb ve ji mafê

wan e ku dezgehên xwe yên nişt imanî û sivîl dabimizrêne ji bû bicihanîna alternatîva demokart û rûxandina rêjîma dîktator ya niha , û kongirê ku li Londinê roja 4 û 5 Hizêranê hate lidarxistin weke Kongirê Damizrêner yê EFN bû , tevî ku beriya wê civîneka şêwirdariyê li Birokselê di meha Avdarê de lidar ketibû lê Kongirê Damzirêner li Londinê bû . Belê min di vî Kongirî de beşdarî kir û li wir jî min pêtiviya beşdariya hundir bi tavilê reng û tiwêje û netewe û tevahiya dezgeh û saziyên civaka sivîl yên girêdayî Sûriyê pêşkêşkir û hemû lihevkirî ne derbarê wê . Helbet , hundir nikare niha eniyên opozisyonê yên radîkal û giring ilan bike weke ku li Londinê pêkhat û diyar e ku hêzên li derve dê bi erkên xwe rabin û dê di pratîkên xwe de û di damizrandina enî û dezgeh û rêxistinan de tiştê ku hundir dixwaze derbibirre . Mesele wisa eşkere ye , û giringiyê bi van xalan dide : - Amadekirina ji bû damezirandina opozisyoneka rêxistî û yekkirina refên opozisyona nişt imanî ya demokrat bi tavilê şepêl û pêkhatiyên wê – danîna lîsteyên rêxistinî û mewdanî û pêwendiyên ramyarî û xeynî wan jî –danîna bernameyekê û formkirina destûrekî nû bo Sûriyê , ev tev ji armancên opozisyona nişt imanî ne li derve û hundir . Dibe ku derve di qonaxên taybet de tiştê ku hundir pê di rame derbibirre , dibe ku hundir ne amade be ku bi eşkerayî beşdarî tiştê li derve pêktê bibe , wisa ez di wê baweriyê de me ku qonax tewawbûna di navbera hundir û derve de dadixe holê , angu derve tiştê ku hundir nikare pêkbîne , bike û wa dibe jî wek nimûne , slogan û perensîpên ku di Kongirê Damizrêner de hatine pêşkêşkirin û yên ku bernameya siyasî bo guherînê hembêz kirin û herweha beyannameyên siyasî tev tiştê ku gelê Sûrî bi hemî tiwêje û netewên xwe dixwaze ,

derbirrîn û hem weke nêrînên opozisyona radîkal yên li Sûriyê ne ji ber hindê ku ez dibînim dem nehatiye ku em navên yên li hundir eşkere bikin yên ku piştgiriya tiştê ku li Londinê pêkhat dikin û tiştê ku Eniya Felata Nîştimanî pêşniyaz dike , lê ez bawer dikim ku tavilê tiwêjên opozisyona nîştimanî ne li dij tiştê ku li Kongirê Damizrêner li Londinê çêbû ne , berevajî vê ez dikarim bibêjim ku piraniya mezin piştgiriya beyanname û bername û pêşniyaz û biryarên Eniya Felata Nîştimanî dikin . Wihareng e ku tiştê min kir ne li dijî perensîpên min yên nîştimanî û neteweyî yaxud nêrînên min yên siyasî ne derbarê giringî dan bi rol û nêrîn û beşdariya hundir , weke min berê jî got , piraniya opozisyonan li seranserî cîhanê li derve destpê dikin dema ku rêjîmeka zordest hebe û rê nede bi çêbûna tiştan bi xuirstî û nehêle ku millet raya xwe bi azadane derbibirre weke xwepêşandan û' itîsam û girêv û belavkirina belavokan , ev tev li Sûriyê qedexe ne di bin saya rêjîma zorbaz ya niha de, vêce tiştê ku li Londinê di Kongirê Damizrêner de pêkhat serkeftinek bû ji gelê Sûrî re bi hemî tiwêje û netewên wî li hundirê Sûriyê . Ev bê guman e û hate xuya kirin piştî belavkirina beyannameyên Kongirê Damizrêner û piştî kongirê rojnamevanî yê ku piştî bidawîbûna kongirê navbirî lidarket , me dît çawa rêjîma Sûrî hisaban dike û dest bi girtinan dike û hewil dike ku hindek misaweman pêkbîne derbarê hindek kêşeyên taybet bi armanca ku tektîka xwe ya taybet derbas bike û xwe biparêze wek ku bi xatû Necah 'Ettar re çêbû dema wê fermana hêlên jor bicih anî û bi hinek serkirdayetiyên rêxistinên Kurdî re civiya da ku were xuya kirin ku rêjîm di riya çareserkirina kêşeya yên bênasname de ye (helbet ne çareserkirina kêşeya neteweyî Kurdî !!) wek ku car bi

car pêkhatiye ji layê raydaran ve dema ku pêdiviya tektîkî ferz dike .....bi gotinekê hêza opozisyonê li derve hêzeke bo opozisoyna li hundirê Sûriyê .

- Yek ji berztirîn beşdarên Kongira Damzirêner û civînên Eniya Felata Nişтimanî li Sûriyê , birrêz Ebdilhelîm Xeddam bû , di vî warî de me gelek gotin bihîstin û gotar xwendin yên ku rexne dikirin derbarê têkiliya te û hevdîtina te pê re , tu çi dibêje ?

- Min birêz Ebdilhelîm Xeddam , cîgirê berê yê serokkomarê Sûriyê dît piştî ku ji û li ser rêjîmê derket û piştî ku nêrîna xwe ya eşkere derbarê : pêwîstiya guherîna demokrat li Sûriyê û dîtina wî ku rêjîm yeka zordest e ku welat û millet bindest kiriye û ji misteke binemalî û hindek efserên mezin di artêş û ewlekariyê de tê hev , her wisa Xeddam dibîne ku rêjîma niha rêjîmeke dîktator e milletê Sûriyê azar dike û devan digire û azadiyan qedexe dike û ji ber wesa piştî ku Xeddam giha van baweriyan , min dît şayiste ku opozisyona nişтimanî Sûrî li derve û hundir-ya ku bi rastî û tekezî xwestina guherînê dike - bixêrhatina wî bike ji ber ku ev dê fakterekî alîkar be di riya bilezkirina guherandina rêjîmê û peydekirina alternatîvê nişтimanî yê demokrat . Tiştê ku Xeddan wêne dike , û ew bi dehan sal di cihê xwe de mîna lîderekî hizbî û siyasî û dilpomat li Sûriyê xulekên berfireh ji endamên partiya Beis li Sûriyê derdibirre û ew dê bi roleka giring rabe di razîkirina gelekan ji Beisiyan ji bû ku dev ji rêjîmê berdin û li dij rabin û Xeddam ji şepêleka fireh li Sûriyê derketiye divê ku em venasînê bikin , û wî gelek gotin û daxuyanî dane û nêrînên xwe eşkere kirine ji ber hindê ku ez dibînim ku hemî layên pêwendîdar ji opozisyona

demokrata welatparêz û herkesê ku paşeroja Sûriyê biha be li nik û baweriya wî bi guherînê were , ez bawer dikim ku pêtivî û pêwîst û sûdemend e ku têkiliyên xebatane yên nû ava bike û li ser bingehên nû bi birêz Ebdilhelîm Xeddam re û bi çi kesê ku li dij rêjîmê radiweste re .....eger guherîn bi ciddî were girtin divê em çi kesê ku ji rêjîmê dûr dikeve ber nedin heta ku karmendekî piçûk be vêce çawa ku yekî mîna Xeddam be yê ku roleka mezin di jiyana siyasî ya welêt de lîst ji dor 4 dehsalan de . Ez bawer dikim ku tiştê pêkhat rewa û xurist bû û ji dema ku min Xeddam naskir û dît , wî pir pêşniyar kirin û vekirî bû û raya yê hember dipijirand eger derbarê rewşa giştî li Sûriyê be û pêşeroja Sûriyê yaxud sebaretî pirsgirêkên siyasî û civakî û çandî û yaxud nisbetî dozên destûr û yasa û nêrîna wî ji doza Kurdî re be ....Erê min ew dît û ez dê dîsa wî bibînim û em niha pêkve di yek enî û yek dezgeh û heman serkirdayetiyê de kar dikin ! .

- Sebaret bi rêjîma Sûrî ya niha , di Belaxnameya Kotahiyê ya Eniyê de hat ku " Rêjîm berbi ketinê de diçe bê guman " , di nêrîna we de rêjîmê temenê xwe yê dîrokî bûrand û berbi tunebûn û nemanê ve diçe , yan ev sipartiye balansên navnetewî û berjewendiyan bi taybetî ?

- Belê , semyanên rêjîmeka wisa tekez dike ku rêjîmên wiha ji mêj de rûxane û hilweşiyane , û ketina rêjîma Sûrî ji ber gelek sedeman bipaş ket weke : bazirganî kirin bi doza Filistînê û dozên netewî û rizgarkirina Colanê û " Ti deng ji dengê cengê bilindtir tune ye " , û sedemê din ku rêjîma Sûrî mîna tavilê rêjîmên totalîter û tek-partî ji

despêkê de xwe siparte atrêş û ewlekariyê û biserket di avakirina artêşeke alîgir û hevaldar bi kêmanî ji layê efserên mezin û pir dezgehên ewlekariyê damizrandin ku li Sûriyê zêde ji 7 alavên ewlekariyê yên eşkere hene ! Ev dezgeh girêdayî rêjîmê ne û berjewendiyên wan bi çarenûsa rêjîmê ve girêdayî ne û para şêr ji budjetê li ser wan tê xerc kirin . Rêjîmê herwesa dest danî ser movikên rewşa aborî û penecerên çalakiya bazirganî li Şam û Heleb û bajarên mezin û li ser bingehên bazirganiya derve di riya dost û nasan de angu rêjîmê ji pêşî de damûdezgeh avakirin da ku xwe biparêze nek ji bo- wek digot- Filistînê rizagr bike yaxud şerê Israilê bike ! . Di baweriya min de ji ber van sedemên gotî hilweşandina rêjîmê bi paşket tev li ku rêjîmên wisa ti derfet nedan bo berzbûna opozisyona nîştimanî û ti hêvî bo çaksaziyê ne hiştin lê berevajî vê zindan û koçbarkirin û dûrxistin para têkoşerên welatparêz bû di hemî pêvajoyên ku rêjîma Sûrî di wan de derbas bû û genedelî û fitne û dabeşbûn para welat û welatiyan bû .

Tekez tevî bipaşketina ku me bas kir lê rûxandina wê ji % 100 e zû yan dereng û gelek sedem û merc û şertên şayiste hene niha ku rêjîm ji holê bête rakirin û alternatîveke nîştimanî û demokrat cî bigire . Em dibînin ku rêjîmên zordest yek li dû yekê dikevin û dirûxin . û ya herî dawî rêjîma Iraqê bû , rêjîma Sedam Hisên ya sitemkar , rêjîma cêwî li gor fikir û siyaset û nêrînê bi rêjîma Şamê re . Li gor dîtin ên Eniya Felata Nîştimanî , asoyên berfireh hene ku mizgîniya felat û rizgarbûna ji vê rîjêmê pir nêzîk e .

- Mamoste Selah , di yekê ji bendên Projekta Niştimanî bo Guherînê ya Eniya Felata Niştimanî li Sûriyê de derbarê rewşa Kurdan li Sûriyê hatiye ku " Bikaranîna milletê Kurd ji mafên xwe yên siyasî û çandî weke tevahiya pêkhatiyên civaka Sûrî " , û ji aliyekî din ve gotina " Milletê Kurd " di Belaxnameya Kotahiyê ya Kongirê Damizrêner ya Eniya Felata Niştimanî li Sûriyê de nehatiye lê "Hevwelatiyên Kurd " , û nêrîna we eşkere ye ku doza Kurd li Sûriyê ne doza hevwelatiyê ye , hun çi dibêjin ?

- Weke te got ne hewceye ez nêrîna xwe ya dîrokî ya naskirî ji doza xwe dubare bikim hinde ku ez serbilind im ku ez yekemîn kes bûm ku li hember xwediyên baweriyên " kêmnetewe" – rabiwestim û rastiya hebûna milletekî Kurd ku li ser axa bav û kalên xwe dijî tekez bikim û herweha erk û stûbariyên vê yekê yên mafperwer yên netewî û demokart û ramiyarî di çarçoveya perensîpa mafê çarenûsî yên milettan de û ne hewce ye ku ez bibêjim ku nêrînên min yên stratîcî yên gotî ji bo min û alîgirên min bive û astengî û hander anîn ta radeya valakirina hin alavan bi tevahî û budjetên taybet ji bo tunekirina me û derbasbûna nav refên me û parçekirina gewdê me . Sebaretî Eniyê , wê nêrîneka balanse bi nêrînên tavilê aliyan ve girt û kêmkirin ji vî û wî çêbûn ta ku em gihîştine yek nêrînê . Eniya Felata Niştimanî weke ku di belge û dokûmentên wê yên taybet û bernameya guherînê de diyare – helbet bername bingeh e – dibîne ku milletekî Kurd li Sûriyê heye , û kêşeyek netewî heye û ji ber wesa banga bicîanîna mafên çandî û siyasî û civakî û aborî yên

milletê Kurd li Sûriyê, dike . Tiştê din ewbû ku Eniyê pijirand ev perensîp têkeve destûrê Sûriyê yê hatî , yê nû de û ev li gor daxwaza me pêkhat û pir giring e . Ji layekî dîtir ve , bendeka din heye ku banga vegerandina pere û mal û mulkiê guhastî û neguhastî li yên ku ji wan hatiye sitendin ji ber sedemên netewî û siyasî,dike û ev girêdayî mijara Zinnara Erebî ye ji ber destdanîna mulikdariyan li ser asta Kurdî ji ber egerên neteweyî pêkhat û ne ji valahiyê hat lê li gor plana Zinnara Erebî bû tev li bangkirina bi vegerandina nasnamê ji xwediyan re, angu rewş wiha ye: Eniyê bo yekem car sebaretî saziyên ku vê dawiyê pêkhatin ji aliyê opozisyonê bi giştî li Sûriyê bi pênasandina rewşa Kurdî wekû doza milletekî ku divê destûr di pêşerojê de tekez bike tevî nerazîbûn û jinûvemezandina di kêşeya Zinnara Erebî û nasnamê de . Helbet min bi eşkerayî xwest ku milletê Kurd mafê xwe yê çarenûsî bikarbîne û hin tiştên din lê weke hun dizanin enî herdem li ser hindek dozên perensîpî yên hevbeş lihev dikin ne weke ku aliyekî taybet dixwaze û ev in gerdenişên eniyan lê ez careka din destnîşan dikim ku tiştê herî giring di vir de ewbû ku pijirandina rewşa Kurdî mîna doza gelekî , mîna dozeke neteweyî , û dozeke mafan ku divê destûrê nû yê Sûriyê tekez bike, ev destûrê ku niha tê formkirin û ev li gor me mijareka giring e û bê guman e ku em dê xebata xwe berdewam bikin ji bo bidestveanîna têhgihîştineke bêtir ji doza me re û ev jî saman û diyalogkirin bi hevpişkên me yên Ereb re di hemî bone û minber û cihan de , pêwîst dike . Em bi gelê Ereb re hevpişk in , û Enî bawer dike ku Kurd şirîkên Ereban e niha û di çarenûsê de û ev jî mijareke cuda bû ku Eniya Felata Nîştimanî li Sûriyê di acenda xwe ya dawîn de ya ku ji Kongirê Damizrêner li Londinê derçû , tekez kir .

- We di gotareka xwe de nivîsandibû û guman di rastiya tiştê ku girûpa Birayên Misilman derbarê doza Kurd de pêşkêş dikin , kiribû . Gelo nêrîna wan niha guhertiye ? We têgihîştin û pijirandin li nik wan dît derbarê mijara Kurdî di civînên Eniyê de li Biroksil û Londinê ?

- Bi rastî min guman nekiribû angu ne ji ber gumanê di nêrîna girûpa Birayên Misilman de , lê min gotarek li ser bernameya wan derheqê rewşa Kurdî de nivîsand û min tê de got ku ew nêrîn dereng hat di pêşî de û diwemîn ne li gor xwestekan bû hinde ku nêrîna Birayên Misilman li doza Kurd dinerî li gor mafên hevwelatîbûn ê . Lê tiştê ku di bernameya Eniya Felata Nîştimanî de cî girt ya ku Ixwanan li ser îmzekirin , di nêrîna min de , nisbetî wan ev pêşveçûnek bû di nêrîna wan de û pêşketîtir e ji ya berê bi gelekî . Ev tişt hem erkekî wan e û têne sipas kirin jî li ser , û ez ji layê xwe de pir kêfxweş im ji vê nêrînê tevî ku cudahî û newekeheviyên di navbera me de pir in lê wek min berê jî got ev in teqalîdên eniyan . Sebaretî doza Kurd, pêşveçûnek di nêrîna herdû layên sereke de pêkhatiye angu Ebdilhelîm Xeddam û Birayên Misilman ku di bernamê Eniyê de tê dîtin , di her sê bendên girêdayî rewşa Kurdî li Sûriyê de , û çi kesê ku bi doza Kurd haydar be ji dema serxwebûna Sûriyê, wê bibîne ku herdû la Beisî û Ixwan dûrî Kurdan bûn , yên pêşî (Beisî) di pêşiya yên ku dijminahî û şerê tevgera Kurdî kir û Kurd sitembar kirin di riya planên Erebkirin û koçbarkirin û bêparkirinê de bê ku ti çareseriyeka demokrat û nîştimanî ji doza Kurd re pêşkêş bikin , û yê diwemîn (Ixwan) di

pêşiya kesên ku guhnedan bi rastiya netewî ya Kurd û di acendên xwe de ti çareserî pêşniyaz nekirin bo çaresrkirina pirsgirêkê li dirêjahiya nîvsedsalekê ji bilî nêrîna wan ya dawîn ya ku pir dereng hat û ev tişt dide xuya kirin ku diyalog bi herdû layan re di çarçoveyên welatperwerane de û bi şêweyên demokarsiyane û karkirina bi wan re di Eniya Felat ê de , ku min bi ya çetintir –sebaretî Kurdan – destpêkir ya ku me nikaribû bikin û min pijirandin û bersivdan û guhdarîkirin dît ku bi maweyan zêdeyî nêrînên hêz û kesayetiyên Erebî Sûrî yên din di refên opozisyon û rêjîmdostan , li vir ez dixwazim bibêjim , di reaksiyonên derbarê kongirê Eniya Felata Niştimanî de ravekarekî bala min kişand ewjî Tirkî Rebî'o bû , yek ji şovinstên Ereb yên Sûrî yê ku di rojanameyeka Kendavî de nivîsîbû derbarê Eniyê de ku radîkalekî Kurd (mebesta wî ez bûm) bi zimanê Kurdî axift di kongirê rojnemevanî de li pêşiya alavên ragihandinê piştî bidawî bûna karûbarên kongirê navbirî , û ev jî bê şik û guman nîşaneka hûr e ku kêşeya Kurd li Sûriyê yeka neteweyî ye.

- Derbarê aliyê Kurdî û daneserheva mala Kurdî ji hundir ve , gelo parçebûnên ku , wek we diyar kir damezrandina 4 rêxistinên nû ji civîna Biroksilê , di vê dema nazik de pêktên li berjewendiya milletê Kurd li Sûriyê ye ? Hun çi çareseriyê pêşniyar dikin ?

- Di vî warî de ez bawer dikim ku imkana dîtina çerseriyeke nêzîk û şayiste bo qeyrana tevgera neteweyî

siyasî Kurdî li Sûriyê heye . ji ber ku dem hatiye ku tev li ser lêvegereke siyasî ku kêmaniya arezû û xwestekên tavilê aliyan hembêz bike, lihev bikin . Ez di wê baweriyê de me, ku bi pratîk ev tişt li hundirê welêt dê zû pêk neyê û ji ber hindê pir sûdemend e ku ev tişt li derveyî Sûriyê pêk were . Di riya beşdarî û erêkirin û tevlîbûna nûnerên tevahiya rêxistinên siyasî Kurdî li derve û hundir tev li saziyên nû di meydanê de yên ku bêtir hatine diyarkirin û xuyakirin ji dema bûyerên 12 Avdara 2004an .

Bê guman , refên nû hene ji serbixwe û rewşenbîran û em afireta Kurd jî jibîrnekin , eva ku refên xwe niha birêdixe , ew jî divê ku deng û rola xwe hebe di lêvegera xwestî de , û ez bawer dikim ku pir şert û merc digihine hev ji bo biserxistina vê ramanê û dost û bira hene ku ji bo vê yekê dixebitin û ti behane û hincet nemane ji hemî latyan re ji bo xwe bidine alî ji van erkên netewî yên pêwîst yên ku qonaxa niha ya bive û nazik wan pêşkêş dike , bi taybetî û em li hember asoyên ku çêbûna guherîna demokrat tekez dikin , divê ku Kurd û tevgera wan ya konevanî amade bin ku rol û maf û cihê Kurdan hebe di Sûriya nû ya birêde,dabîn bikin .

- Pirsa min ya dawîn derbarê kesayetiya we de ye , ji ber ku me vê dawiyê pir gotar û nivîs xwendin derbarê we , hinek ji wan rexnegir û yên dîtir alîgir bûn , hun çi ji herdû layan re dibêjin ?

- Bi rastî , ez çi kesê ku rexneya avaker û baş ji bo pêşveçûn û derbaskirina şaşîtiyan li min dike , sipas dikim ji ber ku ev tiştekî ez pê serbilind im û pesnê xwe pê

didim ji ber ku ji mêjve min dawa rexnê kiriye û ti pêşveçûn bê rexne û xwe-rexne û diyalogê nabe , ez van xortan ji nifşê nû pîroz dikim û bengînî û xortaniya xwe di wan de dibînim û ez wan vedixwînim da ku ew berdewam bin di daxuyakirina têbînî û nivîsên xwe yên rexnegir de derbarê nêrînên min û pratîka min di warê nişţimanî û netewî de .

Sebaretî yên ku rêbaza min dipijirînin û nêrînên min rast dibînin , ez sozê didime wan ku ez li gor baweriya wan bim niha û di pêşerojê de û ez dev ji wê rêbaza ku me bingehên wê ji sala 1965an ve di konferansê Tebaxê yê mêjûyî de danîn naberdim, û ez hêj girêdayî wê rêbaza netewî demokrata çepgir ya dîrokî me ya ku ez dê deyndarê wê bim heta ku ez sax bim di sînorên pêgirêdana ramyarî û ramanî de ! Ji layekî din ve , ez hêvî dikim ku herkes têbigihe ku min bi sê telaqan dev ji karê hizbî berdaye bê veger û ez ne amade me ku guhdariya yên ku – bi niyetbaşî- dixwazin min bikêşin cihên ku ez naxwazim nêzîkî wan bibim yaxud anîna dozên ku bûne mulikê dîrokê û ti sûde nîne di arihandina wan de di vê qonaxê de , ji ber ku di rewşa min ya niha de ez bi erkê xwe yê giştî , nişţimanî û netewî radibim di çarçoveya Kurdayetiyê de û ez ne amade me ku têkivime şerên peyivînî yan gengeşiyê li dora mijarên hizbî yên ku ez ji çerçoveya wan bi vîn û hilbijartina xwe ya azadane derketime , ez herweha dixwazim ku pêwendîdar têbigihin ku diyaloga fikirî û siyasî derbarê dozên me yên hevpar bi eşkerayî û bi şefafiyet û dilfirehî dibe lê munaqeşeyên hizbî û rêxistinî yên ku ez bi wan re ne têkildar im , di kongir û civînên girtî de dibin , ji ber hindê ku ez tevan vedixwînim bo

herdû layan têkel nekin û taybetmendiya yê dîtir qedexe nekin û dest nedînin ser azadiya yê dîtir û dûr bikevin ji awayê lêpirsînê û lîstina rola polîs bê ti bingehên yasayî û legal .

- Mamoste Selah Bedredîn , ramanvan û siyasetmedarê Kurd , sipas ji bo we !

- Sipas!

Hevdîtina : Dr. Ridwan Elî û Besam Mistefa
Hewlêr – Kurdsitana Iraqê 27/6/2006.

Beşê Diwem

Hevpeyivîneke Berfireh û Taybet
bi Siyasetmedar û
Ramanvanê Kurd
Selah Bedredîn re

-Berî demekê me hevpeyvîneke ramyarî bi ramanvanê demokratî netewî Selah Bedredîn re çêkir , li ser Eniya Felata Niştimanî li Sûriyê û nerîna wî derbarê hindek civîn û çalakiyên ku li Wîlayetên Yekgirtî yên Emerîka û Ewiropayê lidar ketin girêdayî bi Kurdên Sûrî û opozisyona niştimaniya Sûrî . Hevpeyivîna gotî bala raya giştî ya Kurdî û Erebî li Sûriyê kişand û hate belavkirin di alav û dezgehên ragihandinê yên Kurdistanî de , û niha em careke din li mamsote Selah vedigerin bi boneya 42emîn salvegera lidarxistina konferansê 5î Tebaxê sala 1965an yê ku bû mîna despêka prosêseke nûbûnê ya kûr di fikirê konevanî Kurdî de û despêke rêbazeke têkoşera tewaw û bipêşketî di nava tevgera netewî ya Kurd de û wek ku tê zanîn mihvanê me rola sereke di girêdan û biserxistin û bicihanîna armancên konferansê navbirî de leyist , hinde ku me dît axavtina me ne tenê li dora konferans û kitekitên wê be , lê me hewil da ku ew doz û pirsgirêkên ramanî û felsefî û siyasî û çandî û ayindeyî ku bi rengekî direkt bi mijara hevpeyivînê ve pêwendîdar in , hembêz bike , evên ku bi kêmtirîn şêwe berê hatine gotûbêjkirin û hêjî hinek ji wan doz û pirsan li bendê ne ku hinek bi cegerdarî û zelalî wan

guftûgo û minaqeşe bikin . Bê guman , nifşê nû û ciwan yê ku ne hevçaxê salên damizrandinê û nejî rojên guherîna mêjûyî ya Tebaxa 1965an bû ,dê berî herkesî ve hevpeyvîna taybet û kûr bişopîne bi giringtirîn damizrênerên ramana Kurdiya hevdem re û yek ji avakerên stratîciya netewî û nîştimanî ya xebat û têkoşîna nifşê xwe û yê pey re jî yê ku niha hevjana rojeva tevgera siyasiya Kurdî dike .

Hevpeyvînger : Ji Desteya Nivîskara ya Kovara " Hawara Nû "

Besam Mistefa û Vedan Adem

-Ji sala 1970ê ve û bi taybetî piştî sala 1965an guftûgo û minaqeşe berdewam in di navbera partî û girûpan de derbareyê kê " mîratgîrê " -eger rast be em bibêjin- Partiya Demokrata Kurdistanî – Sûriyê ye , û şerên bê çek diqewimin li dor legalîteyê... tu dikare rastiya meselê ji me re ronî bike ?

- Lêgaletî ne hema hema yaxud bi koratî tê dayîn ji ber ku bingeh û perensîp û pêkhate û foniqsiyonên wê hene tevî ku pênaseyeka wê ya taybet jî li ser hemî astan heye û hem pîvan û şert û mercên wê yên fermî û li ser asteya dewlet û hikûmetan û tê zanîn ku ew ji perensîpên destûr û lihevkirina gel di riya parlementoyê de der diçe li gor yasayên likar û ne li dijî biryarên dadperweriyane û ji vê re tê gotin lêgalîteya yasayî , lê nisbetî tevgerên rizgarîxwaz û partiyên siyasî û rêxistinên civaka sivîl hindek pîvanên dîtir jê re hene weke pêgirêdana bi

perensîp û armancên çesipandî di bername û bendên biryarkirî ji layê heyetên hilbijartî û herweha rêbaza siyasiya giştî ya biryarkirî û heyetên rêxistinî li gor bernamên hindirû yên bikarhatî jiber biryarên kongire û civînên fireh , û guman tê de nîne ku pêgirtina tewaw bi perensîp û stratîciyan û karkirina bê westan ji bo bicihanîna wan li ser asta pratîk lêgaletiya xebatgerî didin di rewşên karê siyasî yê aştiyane di bin saya rêjîmên deselatdar çi dîktator yaxud demokrat de lê di rewşên guhastinê bo qonaxên nû û rû bi rûbûna dozên çarenivîsî û şiyana çêbûna guhertinên bingehînî li ser asta guherîna demokrat û bidestxistina xwestekên stratîcî –wekû rewşa Sûrî ya niha - , milgirtina gel û cemawer û berzkirina ala xebat û têkoşanê li gor berjewendî û vîna piraniya millî lêgaletiya şoreşgerî dide û di hin rewşên dîtir de dema ku nakokî û nelihevkirin di navbera du layan yan zêdetir de biqewime çi rêxistin yan girûp yan takekes li dor postên lêgaletiya serkirdayetî û lêveger û deselatdariyê , çare di vegera berbi rastiyên dîrokê yên nû û kevin ve û dosiya layan û nêrînên wan yên caran û yên niha û tiştê ku wan bi pratîk û teorî pêkanîne tev li rola wan di wan dozên gotî de û radeya hêjatiya wan û hemahengiya wan bi pêşveçûnên niha re ,û di bin saya van pîvanan de lêgaletiya mêjûyî tête dan . Sebaret bi rewşa tevgera me ya naskirî ve , ew îro herî zêde bi hewceyî hersê stûnên lêgaletiyê ye : mêjûyî û şoreşgêrî û millî ,û imkan heye ku mirov li wan bigere û mûqayise û nêzîkahiyan çêbike û destnîşankirina yê herî nêzîk û çak li gor bingeh û semyan û şert û mercên navhatî û ew her hal di rêxistineke taybet de niha nayêne peydekirin ! , dibe ku hindek – partî û girûp û takekes – hebin ji xeynî xwe nêzîktir bin ji semyanên lêgal weke girûpên Konferansa Tebax- 1965an

lê tevî wilo jî şert in din hene da tewaw bibin pêdiviye ew peyde bibin lê ewên ku car bi car xwe davêjine legaletiyê da ku liv û tevgerên xwe rewa bikin di warê ceribandinên bi girûpan re û zêdekirina rasteqîniyê ji pêgirtinên wan yên rêxistinî , şîreta min ji wan re ew e ku ew hew berbi paş ve bazbidin û pesinê karpêkên xwe yên qelp û durû bidin ji ber ku ew nikarin bi realitê re rûbirû bibin û erkên pêwîst pêk bînin ....dûvre yê ku dixwaze tevlî karê ciddî yê rewşenbîrî û siyasî bibe ji bo doza gel ne hewceye tukes bîlitên legaletiyê bidiyê de ! .

- Hun ji kesên yekemîn bûn ku we rêbaza Barzaniyê nemir wekû çarçeweyeke hizrî-siyasî- xebatane li qelem da dûr ji hesta konkrêt û we hewil da ku hun guherînên bingehînî di şêweya vejandina bîranîna Barzaniyê nemir li mezargeha herdû nemiran li devera Barzan pêkbînin , û dîsa hun ji nav hemû ramanvan û rewşenbîrên netewî yên Kurd yê pêşî bûn di pêşkêşkirina idiyoma – Barzanîzim-ê de û daxwaziya jinûve formkirina wê , ev tiştê ku hişt dijminên nû ji we re peyde bibin û hun rastî rexnê werin ji pir layan ve hinek ji wan gumanê li we dibirin ji ber nêrînên we yên rexnegir di pêvajoyên taybet de derbarê siyasetên partiya Barzaniyê nemir , hun dikarin vê mijarê ji bo me şîrove bikin ?

- Belê , di despêkê de divê em di nav du tiştan de cûdahiyê bikin : rêbaza Barzanî yaxud Barzanîzm, û Partiyê de . Rêbaza Barzanî hate damizrandin û pêkhatiyên wê hatine ser hev ji dema tevgera şêx Ebdilselam anku ji berî nîv sedsalekê ji diyarbûna partiyê û hindek hebûn ku alîgiriya rêbazê dikirin bê ku

endamtiya partiyê bikin , pêtiviyên rewşa Kurdî û pêwîstiyên birêxistina kar hiştin ku Barzanî serkirdayetiya partiyê bike di heman dema ku ew di dubendiyeke berdewam de bû bi idolojiya lîderên wê re û şêwaza danûsitandina wan bi xelkê re û dîtina wan ji pirsgirêka netewî re . Her weha, dibû ku tu bi armancên Barzaniyê nemir yên netewî û niştimanî re ji aliyê straticî ve lihev bana û pê re hemaheng bana derbarê piraniya nêrnînên wî yên siyasî û danûsitana wî bi dozên germ yên çaxa wî re û di eynî demê de cihêwaz be bi serkirdayetiya partiya wî re sebaretî gelek pirsgirêkên rêbazî û siyasî û pratikî bi taybetî derbarê nêrîna Kurdistanî û pêwendiyên netewî û herêmî û ev tişt car car pêkhat bi hevalbendên wan endamên tevgera Kurdistanî di nav de partiya me tiştê ku tê bîra min dema ez di posta biryardanê de bûm girêdayî xuristiya têkiliyên dualî û netewî û nêrîna siyasî derbarê pirsên herêmî û navnetewî tiştê ku kêşeyeke micid û tirsnak di pir deman de peyda kir bi sedema xwediyên nêrîna ne cudakirina di navbera rêbaz û partiyê de, bi taybetî ji layê hindek serkirdayetiyên hizbî yên ku xiniziya Barzaniyetê kirin berî xeynî xwe û ya partiyê jî , û hinekan hema hema cûdahiyên me bi birayên me yên di serkirdayetiya partiyê de mîna dijminahiyekê şîrove kirin –mixabin – ev ji rastiyê dûr e .

Barzanîzim vîn , rêbaz , tevger û baweriyeke xebatane ye ku şikl û naveroka karê netewî Kurdî – Kurdayetî-damizrandiye, çêbû û bi xwe re tovê hebûn û berdewamiya xwe hilgirt , lê partî çarçeweyeke rêxistinî ye ku tiwêje û çînên cuda cuda hembêz dike di qonaxên taybet de ,dibe ku were helkirin û nehiştin bi biryareke kongirekî li gor bernameya hundirîn lê rêbaz ,li milê din,her di mejî û wîjdanan de jîndar e û ji nifşekî

diguheze bo yekî dîtir , dibe ku nav û bernamyê partiyê were gûherandin lê sebaret bi rêbazê ev nayê pijirandin , anku pêwîst e cûdahîkirin di navbera herduyan de pêk were .

Di çarçeweya bipêşveçûna objektîvane ji pêşketina rewşa min ya taybet bi Barzanîzmê re –dibe ku ji bilî min jî ji nifşê min tê de derbas bû bin – bi kurtî haydariya min ya mirovane di malzarokiya xwe de bû û bi bandora fakterên perwerdehiya malbatê ya tije bi perensîpên nişтimanî tev li kartêkirina jîngeha civakî bi efsaneya Barzanî dagirtî bû û ev tişt guherî bo cihekî zelaltir dema ku hezkirin guherî bo rastiyeke neteweyî ya nimûneyî ku sembol lîderekî dilêr û mêrxas û siyastmedarekî berhemdar û lêvegereke birûmet di warên gera li rastiya Kurdî de û jinûve pênasekirina Kurdan û jinûve xwendina hizra netewî û dîtina riyên herî baş ji bo avakirina têkiliyên hemahengiyê bi Ereban û tavilê gelên herêmê û çareserkirina pirsgirêkên Kurdî bi şêwazeke aştiyane li gor bingeha hevjana Erebî -Kurdî .

Paşê xewn bicî hat û hevdîtina xwestî bi Barzaniyê nemir re di sala 1967an pêkhat de tevî hemî sawa wê û ew bû despêkeke nû di jiyana min ya siyasî de berbi qonaxeke nû ve di warê destdanîna ser rastiyan ji cihê wan bi xwe heta weke îro li dirêjahiya 40 salan .. yên ku helbet ne di riyeke rast de birê ketin lê rawestgeh û çewtiyên mîna rewşa Kurdî ya giştî , bi xwe dîtin . Ji layekî dîtir ve, belê min li gor erkên xwe tevger kir derbarê Barzaniyê nemir ev sembola netewî û nêrîna min diyar û belvkirî û dûkumentkiriye di vî warî de û hinek ji wan cuda bûn di hinek qonaxan de bi hindek nêrînên wî re û divê ku ez

bibêjim ku Barzaniyê nemir li wan cudabîrên min guhdarî dikir û dipijirandin jî û ez dê hewil bidim heta ku ez dikarim ji bo bicihanîna tiştê ez hêvî dikim di vî biyavî de niha û di paşerojê dê li gor baweriyên min yên perensîp.

Hindek hene ku ji idiyoma Barzanîzm dilzar dibin ne ji ber sedemên hêja yên zanistî yaxud lingûstîk lê ji ber ku ez yê pêşî bûm ku min ew pêşkêşkir , û ji dêvla wê ve Barzaniyetê bikar tînin.. ev kes tênagihin ku ez li koka zimanî ya Kurdî – Latînî vedigerim eynî wek ku çawa piraniya rewşenbîrên Kurd li koka Kurdî vedigerin ji bo idiyoma Kurdayetî yan koka Latînî ji hin derbirînan re ku vedigerin şûn û dibistanên hizrî û felsefî ji bilîmetên dîroka mirovî lê ewên rexnegir vedigerin idiyoma lingûstîk ya Erebî û wate her yek e di herdû rewşan de û ez serbilind im ku ez yekem kes bûm ji aliyên hizrî û siyasî ve di bikaranîna çend gotin û idiyomên zanistî ku hevaheng in bi radeya bîrewerî û realita objektîv û bi dirêjahiya demê re hatine qebûlkirin û pijirandin weke: " Milletê Kurd li Sûriyê " , "Mafê Çarenûsî ji bo Kurdan " , "Rojavayê Kurdistanê " , "Eniya Kurdî ya Nîştimanî a Hevgirtî " , Hevbendiya di navbera Tevgera Azadîxwaza Kurdî - Erebî " , " Hevpişkiya Kurdî- Erebî " , " Çareserkirina Pirsgirêka Kurdî di çarçeweya Çareseriya Nîştimanî ya Demokrat ya Gîştî li Sûriyê " û " Tevgera Neteweyî Kurdî ya Siyasî parçeyeke ji Opozisyona Nîştimanî Sûrî ye li ser riya Guherînê " ...vêce gelo ew kesên gotî wê – serhişkiyê – bikin di bikarnîna van gotin û idiyom û sloganan de ? Ez naxwazim wa bikin ! .

Ji layekî dîtir ve, pêwîste bê gotin ku hindik ji siyasetmedar û rewşenbîrên Kurd yên Sûrî bi tundî û ta

radeya tinazîpêkirin û gumanbirînê li dijî tiştê ku min berhem dida ji silogan û idiyomên nû di rewşên wan yên taybet de û her weha derbarê alternatîv û nêrînên min yên siyasî û pratik ku min ew di wextê şayiste de digirtin ji zêdeyî 30 salan û heta niha derdiketin, lê min paşê didît ku hinek ji wan kesan li xwe vedigerin û vedigerin ser riya rast bê xirûcir û xwe-rexnekirin û ti destnîşankirina rola min ya berhemdar di wî biyavî de – weke rewşa Cîhana Sêyem – û beşekî din jî ez wan car bi car dibînim ku ew keysan naberdin û bi zikxişkê ayetên biyakirin û poşmaniyê di amadebûna şagirtên – Barzanîzmê – de pêşkêş dikin beramberî armancên taybet û kesane bê ku mêraniya wan hebe ku vî tiştî ji derveyî jûrên teng de û xwe-rexnê bikar bînin û rastiya xwe eşkere bikin û ji wan were ku tukes nizane wê rastiyê tevî dem û cih !, û tevî van hemî çewtî û xwariyan – ez bi rastî kêfxweş dibim dema ku yê şaşbûyî li xwe vedigere û ez bi xweşiya serkeftinê hest dibim her carê ta ku mijar girêdayî pîstirîn" mirovan " be jî .

- İdiyomeke din jî heye hun yekem kes bûn ku ew pêşkêşkirin girêdayî bi rêbaza Barzanî û Kurdistana İraqê ve , mebesta min (Pilingê Mêzopotamiya) ya ku we ew yekem car di konferansa pêncan ya Kombenda Kawa bo Çanda Kurdî de pêşkêşkir, hun çi dibêjin ?

- Belê ,ez bi kurtî dikarim bibêjim ku ji ber derengketina çareserkirina pirsgirêka Kurdî û bi taybetî li Kurdistana İraqê û ketinserheva wê tecrûbeya dîrokî ya pirbuha û hebûna rêbaza Barzanî bi rastî û tolerans û

demokrasiya xwe ve di warê danûsitandinê bi gel û netewe û ol û mezhebên İraqê û girêdana bi perensîp û pêdariyên neteweyî û nişţimanî û nermliva siyasî û tolerans di girtina nêrînên siyasî û israrkirina bicihanîna guherînê li İraqê û beşdariya aktîvane di prosesa siyasî ji bo Iraqa pirreng a federe ya demokrat , ji ber van sedemên navbirî tevan û ji ber hebûna serkirdayetiya aktîvane ya hevaheng bi pêşveçûnên herdû rewşên lokal û navdewletî di ser serokatiya herêm û hikumetê de Kurdistana İraqê niha geşebûna teqilandineke demokrasî-siyasî-aborî bi xwe digire ku bê hempa ye di herêmê de xwe dispêre rêbaza pêşketina aştiyane û şiyarbûna aborî û viberanînê û bazara azad li gor yasaya viberanînê ya herî diyar û zelal û bi şefafiyêt li Rojhilata Navîn (zagona nûmre 4ya îsal) û di bin saya demokarsiyeke siyasiya plûral a rasityane û seqamgîriyeke asayişî û serdestiya yasa û parlementoyeke hilbijartî , û eger ku welatên Başûr rohjhilatê Asiyayê bûyine giregir di warê aborî de û bi hêjayi paşnavê - Pilingên Asiyayê -wergirtine , min jî navê – Pilingê Mêzopotamiya – li ezmûna Kurdistana İraqê kir bi hêviya derketina piling in din di herêmê de .

- Hun çi derbarê konferansê 5î Tebax a 1965an de dibêjin bi boneya nêzîkbûna salvegera wê ?

- Konferansa Tebaxê xalguherîneke tûj bû di riya rojeva tevgera neteweyî Kurd de û wê asoyên straticî yên nuh li pêşiya xebata nişţimaniya Kurd vekirin bi tiştê ku bi xwe hilgirt weke jinûve danasandina pirsa pêwendiyên Kurd û Ereban û şopnadina avakirina wan ji bo cara yekem bi rengê wan yê siyasî yê hûr û her weha sebaretî

pirsgirêke neteweya Kurd di çarçoveya doza netewî demokrat de û slogan û bernameyên girêdayî bi xwezaya qonaxê re û pêwîstiya girêdan û avakirina eniya yekgirtî di navbera tavilê tiwêje û çînên nişтimanî yên lihevkirî li ser bernameyeke hevbeş û plan û alavên kar ku nûbarê wan çavdêrîkirina damizrandina şandeya nişтimanî Kurdî di orta salên 60î ji babelîska bûrî ve ji nûnerên tavilê pêkhatiyên civakî li parêzgeha Cizîrê weke derbirînekê ji dîtina me ji xuristiya pêvajoyê re û pêdiviya beşdarbûna tevahiya çîn û tiwêjên nişтimanî di herdû dozên neteweyî û nişтimanî de û çûbûna bo Şamê paytexta Sûriyê ji bo hevdîtina serokê hikûmeta Sûrî , û rûbirûbûneya millî û cotyaran li dijî alavên deselatê ji bo têkbirina plana Zinnara Erebî û şiyarkirina cemaweran bi riyên nû weke belavkirina belavokên ku siloganên siyasî û daxwazên girêdayî mafên Kurdan û dozên gelê Sûrî bi giştî vedihewînin di hemî bajar û bajarokên Cizîrê di heman demê de , her weha Konferans bû despêka peydabûna komine nûjen tije bi çalakî û aktîviyane di nav de tevahiya tiwêje û çînên komelgeha Kurdî di tavilê deverên ku Kurd lê dijîn de û têkilkirina wan di herdû mijarên neteweyî û nişтimanî de .

Xalguherînoka Tebaxê, weke tewawkirina şert û mercên damizrandinê, bû mîna gaveke bipaşixstî piştî derbasbûna 8 salan ku tevgerê ne seqamgîriya siyasî û ne ya hizrî jî nedît lê berevajî vê wê enadm û alîgir westandin û serkirdayetî ji hev dûr xistin û nakokiyên takekesî û cudabîrî geş kirin , û konferans fakterekî nasik bû di warê cudakirina yê çak û yê neçak û felatkirina kokê ji qaşilên kevin û kevnare û vegerandina giyanî berbi laşê tevgerê ve bi taybetî ji paş ku ew jihevketî bûbû û nakokî û

parçebûnê ew sar kiribû , û gaveke pêdar bû ji bû derketina ji xêza xewnan û çarçeweya hestiya konkrît û hestên neteweyî yên germ ku geş û gur dibûn di dema pêşkêşkirina helbestên germker yên nêzîk ji jîngeha heleqeyên zikirê berbi rûbirûbûneya realitê û ravekirina barodoxan bi şêweyekî zanistiyane û objektîviyane ve û xwendina hemî şiyanan û tevahiya wan çetin û tund bûn ,bi hewceyî pirtir semax û qurbanîdanê bûn ta bicihanîna armanca daxwazkirî di warê çareserkirina kêşeya netewî Kurdî di çarçeweya çareseriya nîştimanî ya demokrat ya gîştî li welêt de , û kêm caran sedemên objektiv û sebjektiv yên derve û hundir yên mejûyî û niha yên hizrî û siyasî pratîk û rêxistinî kom dibin derbarê bûyereka taybet wek ku komîserhev bûn û tewaw bûn di prosesa guherînê li konferansê Tebaxê tevî wê germiya bê hempa û keda jiberxweve ya giranbuha û karê bê westan yê girûpane ji layê wê koma rengereng ji aliyê civakî ve ya nêziktir ji tiwêjên binpêkirî û ronakbîr di heman demê de yên xwediyê orîjinaletiyeke dîrokî di biwarê karê neteweyî û navekî nîştimanî yê paqij tevî xwendineke rast ji paşerojê re û hetsbûna bi pirsiyariyê û ya xwe qurbankirî ji bo perensipên xwe yên hevbeş ya ku bû çavdêrê biserketina prosesê û felatkirina tevgerê .

Pirsgirêkên cûdabîrî û cihêwaziyê yên ku Konferansa Tebaxê ew kifş kirin û xistine bin ronahiyê û biryar derheqê wan de da ne tenê bi Rastgerên Kurd re bûn, lê di bingeha xwe de bi nêrîn û siyaset û bikaranînên deselatdariya rêjîma serdest re bûn : Rêjîm venasînê nade bi hebnûna Kurdan û me jî got ku Kurd milletek e xwediyê hemî semiyanên neteweyî ye û li ser axa bav û kalên xwe dijî .

Rêjîm, maksîmum, bi kotekî dipijirîne ku doza Kurdî di çarçeweya daxwazên çandî de be û me jî got ku doz netewî û siyasî ye ji pileya yekemîn e û bi hewceyî, di heman demê de, çareseriyeke nişтimanî demokrat a Sûrî ye.

Rêjîm dixebite da ku tevgera siyasiya Kurdî ji tevgera opozisyona demokratîk veqetîne û wê di riya ajanên xwe de birêve bibe û me jî got ku tevgera neteweyî Kurdî parçeyekî sereke ye ji bizava nişтimanî ya Sûrî û di refên pêşîn yê opozisyonê de ye .

Rêjîm rêbiriya çi hêvîyeke şiyarbûnê ya Kurdistanî dibû li dirawsê di parçeyên Kurdistanê yên dîtir de û hewil dide ku kedîkirina çi layekî li berjewendiya acenda xwe li deverê û nakokiyên xwe yên herêmî û ji bo pêkanîna armancên xwe li alavên Kurdî Sûrî digeriya û em ji vê – davikê- derketin û me tiştê pêkdihat xerq kir û me nerîna Kurdistanî ya şaysite girt dûr ji daxwazên rêjîmê û me her weha danûsitandin û hevahengî bi serokê lêgal yê mêjûyî yê şoreşa Îlonê li Kurdistana Îraqê re pêk anî .

- Gelo ev hemî ne bes in ku dêwên deselata şovonîst derkevin pêşiya me ?

Wisa şerê me yê sereke û bingehîn bi hêzên deselatê û alavên rêjîme yên ku xwe bi dewletê û pere û serdestî û bendîxane û alavên tepeserkirinê û pisporan bihêz dikirin ku weke naskiriye girûp û takekes li ser astên tavil ji jîngeha Kurdî bi xwe bikartanîn çiqas ku lazim bana , dibe ku bête dîtin dem bi dem radeya tundiya tolistînê ya

ji layê deselatê ve di rûbirûbûnweyê wê bi derbirîna hizbî rêxistinî û siyasî ya rêbaza Tebaxê ji berî zêdetir ji 30 salî û heya niha weke nimûneya nakokiyê di navbera du projektên cudabîr û weke derbirrîneke diyar û eşkere ne tenê derbarê dijminhiya rêbaza Tebaxê û perensîp û idiyom û armanc û bernameyekî çeareseriyê yê zelal û xurû ,lê belê derbareyê nepijirandina hebûna Kurdî û guhnedana doza wî ya neteweyî û ne pijirandina hebûna milletekî Kurd û ew herdû jî, rojekê ji rojan, deselatê cudahî di nav wan de nekiriye .

- Partiya we ya caran partiya Tebaxê li ku ma ? û çi ji bo hizra jinûve avakirina wê piştî ku ew bû komik û girûp,tê kirin ?

- Ji despêka guherînê de em di pêvajoyeke çetin de derbas bûn ji rûbirûbûna bi deselata sistema ewlekarî ya serdest ya ku despêkir bi hewildanên firehkirina kartêkirina xwe ya herêmî da ku kêşeya Kurdî jî hembêz bike û ya ku straticiyek û tektîkeka nû danîn di bin saya balansên ne wekehev û xwar ku ji despêka salên 80 ji çerxa bûrî ve despêkirin û em dikarin nav lê bikin – Qonaxa Bavê Casim – nisbetî serleşkerê şû'beya istixbaratên leşkerî – Mihemmed Mensûre – yê ku kartêkirinên xwe yên reha di warê parçekirin û jinûve avakirina rêxistinên Kurdî ji serkomariyê werdigirt ji ber ku ew mîna yekemîn berpirsiyar ê dosiya Kurdî li Sûriyê û dewletên cinar bijartibû , ev kesê ku tê naskirin bi şêwaza xwe ya nermliv-ji derve ve û bikaranînên xwe yên pîs û ziyanker di realitê de û têkilbûna wî ya berfireh di nav hindek jîngehên Kurdî berevajî şêwazên polîsî di warê terorkirina mirovan bi eşkerayî û tundî yên ku berê di

dema Mekteba Diwem û ewlekariya siyasî û îdareya Yûsiv Tehtûh de dihatine meşandin . Bavê Casim bihtirîn salên xizmeta xwe li Qamişloyê derbas kirin û neçû ta ku tevgera Kurdî ya siyasî ya mêjûyî parçe parçe kir û ew guherand bo komikên parçebûyî û dijîhev û dubend, tevî nakokiyên bê dawî û sînor di warê pêwendiyên di navbera têkildarên karûbar û rewşên tevgera Kurdî .

Erka yekê ya dezgehên ewlekariya deselatê ew bû çareserkirina pirsgirêka partiya Tebaxê bi şêwazê xwe û li gor berjewendiyên xwe (Partiya Demokrata Kurdî Çep , duvre Partiya Hevgirtina Gelêrî Kurdî piştî guhertina nav di Konferansê Pêncan de sala 1975an) , her weha deselatê viberanîn di warê pêkanîna plana xwe de ji hindek layên Kurdî Sûrî û ne Sûrî jî kir û li gor agahî û nûçe û belgeyên dûkumentkirî, ji ber kar û îşê serokên ewlekariyê û birêvebirên wan li deverên Kurdî ji holê rakirina rêbaza Tebaxê ya hizrî û konevanî û rêxistinî bû, ev tiştê ku jê re amadekarî û fînansekirin û plankirin û girtin û bê nasname kirin û ji mafên sivîl bêpar kirin di gelek rewşan de weke ya min tevî kirîna wîjdanan û sozdana bi hinekan bi başkirina rewşa wan ya takekes beramberî bersivdan û responsekirina plana navhatî di nav de karmendkirina hinekan di dezgehên naskirî de tevî tundkirina alavên tirsê û ji kar dûrxistina hezaran kes , anku deselatê têgihişt ku rêbaza Tebaxê tevî gelêrî û cemaweriya xwe dê dijminekî mandûker û gefxwer be ku li ber çav tête girtin ne ji ber ku alîgirên rêbaza navbirî tûndûtîjî bikaranîn yaxud rahiştine çekan yan alîkariya dijminên welêt kirin yan daxwaziya serxwebûnê kirin; lê ji ber ku wan bi rastî û realetî wijdan û hêvî û êş û armancên piraniya mezin ji milletê Kurd derbirrîn û destê hevalbendî û hevgirtin û

arîkariyê dirêjî tevgera demokratîxwaza Sûrî û bizava rizgarîxwaza Erebî li derveyî Sûriyê û bi taybetî tevgera berxwedana Filistinî kirin , û ev tev wek ku tê zanîn dijberî xûristiya rêjîma diktatora şovonî ye , hîn bêitr ew wisa dihate dorpêçkirin û tazîkirin di riya komkirin û peydekirina heval û hevalbendan li hundir ê Sûrî û dewletên Erebî û ta ku li paytextên Ewiropayê jî , ji ber vê hindê ku rêjîmê dest bi bicihanîna plana xwe kir li gor biryareke siyasiya hûr û armanca xwe ,mixabin-pêkanî ....cihê dax û mixabiniyê ye ku partiya Tebaxê û aldarê wê û xwediyê kelepora wê ya hizrî û xebatger guherî bo çend girûpan hindek ji wan encama dijtijekirina derewîn û çanda îxantkirinê eva ku bi hewceyî jinvûe perwerdekirinê ye ta ku vegere ser riya rast û dirust , ta niha ez ji wan kesan im ku daxwaziya vegera van girûpan bo kok û rehên Tebaxê pişti ji holê rakirina tiştê ku hatiye çandin di qonaxa –Bavê Casim – de û vegerandina damizrandina rêxistinî jinûve tevî ku tê zanîn ku tişt weke xwe namînin û rabûna Kurdî Sûrî ya 12 Avdara 2004an realiteke nû avakiriye û ji verêja wê hindek projektên hêzên nû ji nifşê nû peyde bûne û tiwêja afiretan jî zor girîng e divê em jibîr nekin û hisabê wê bikin di dahatû de û di warê ravekirina nexşeya siyasî ya paşerojê ya tegvera netewî Kurdî li Sûriyê.

- Hun çi di derheqê hevalên xwe yên kevin de dibêjin , bi taybetî yên ku hun bi wan re cudabîr û cihêwaz bûn ?

- Ez hêjî piraniya mezin ji hevalên xwe bi xêr û rêz û hurmet bibîr tînim, û ez wan rojan jibîr nakim ewên ku me bi hev re qedandin di xweşî û nexwşiyê de û hindek ji

wan hene ku ez bi rêzeka zor mezin li wan dinerim ji ber xwefîdakirina wan û qurbanîdanên wan û hizra wan ya gihiştî û ez ji hevalên xwe veneqetiyame û bi gelek riyan weke hevdîtinan ta bi itîsalatan ta bigihje gorîna nêrîn û bîrûboçûnan di riya ragihandinê de û bi taybetî televiziyon û enternetê de danûsitandinê bi wan re dikim , li milê din ez dexesî û zikreşiyê li tukesî nakim ;ez ji pêşî de wisa bûm û heta dawî ji ez dê wisa bimînim lê ev perensîp rastiya ku ez di tecrûbeya xwe ya dirêj de car bi car rastî îxanet û xiniziya yên din hatim û min pir tiştên bêzar û êşdar li dora kesên ku min ew rêhevalên xwe dijmartin û hêviya xêr û başîtiyê ji wan dikir, tune nake . Di heman warî de, ev qet nabe sedem ku ez vexwendineka rast û cegerdar ji aliyê xwe de bikim ji bû lihevhatin û lêborîn û lihevkirina li dora perensîpan û vejandina perensîpên Tebaxê û bipêşxistina wan û bikaranîna xwe-rexnekirin û venasîn bi şaşîtiyê ji layê yê ku dixwaze lixwe û li bineghan vegere û ez dûr nabînim ku gelek dê bihelweşin û hineka nû derbikevin ji derveyî çarçeweya girûpên Tebaxê yên naskirî , tekekes û girûp.

- Tu dê vegere ?

- Min dev ji meydana hizrî û rewşenbîrî û siyasî bi herdû milên wê yên neteweyî û nîştimanî ne berdaye ta ku ez vegerim ! Lê eger mebsta te ez li partiyê vegerim hingî ez dibêjim na , min dev ji karê rexistinî berdaye û ez ji biryara xwe nayême xwarê, û ev tişt nayê wê wateyê ku ez li dijî karê hizbî û rêxistinî me weke alavekê; berevajî vê ez di wê baweriyê de me ku Kurd niha ji herdemî bêtir bi hewceyî karê rêxistinî û avakirina damûdezgehan e tev li serkirdayetiya bikom di tavilê warên jiyanê de .

-Hun çawa rêzgel û refên bizava siyasiya Kurdî ya niha dixwînin û çi ye li gor nêrîna we riya çareserkirina qeyrana tevgera me ?

- Ez rewşê weke ku heye dibînim : qeyraneke mezin û belavbûyî piralî ku nasnameya siyasî û neteweyî û nişтimanî û post û rol û nêrîn û dîtin û erk û bernameyan hembêz dike , subjektîv : bêkêriyek li ser herdû astên – bernamey î heykelî rêxistinî – û serkirdayetî û matmayin û dudilî li hemberî şiyanên paşreoja nişтimanî li sera sta guherînê û têkçûnek di warê dîtina posta pêwîst ji Kurdan û kêşeya wan re , hemû la ji vê qeyranê têşin çep û rast û em tev berpirs in bi rengekî ji rengan ji dîtina çareseriyekê ji qeyrana me ya neteweyî û nişтimanî re , ji layekî dîtir ve eger ku Rastgeriya Kurdî ya teqlîdî bi tevahiya girûp û komikên xwe dê buhayê israrkirina xwe li ser şaşîtiyê berî xeynî xwe bide, bi taybetî piştî dûrketina wî ya tewaw ji cemawerên Kurd derbarê hebûn û çarenûsa xwe, xwe disprêre du tiştan yekem mabûna rêjima ku ew çêkir û xwedîkir û gelek caran ew xilas kir û bi taybetî ji sala 1965an ve – û ev rengeke ji wefadarî û soz bicîanînê – û eger ku ev rastî nenas be li gel hinekan ewjî ji ber bikaranîna şaşkirina siyasî û çewtî û veşartina rastiyê ji ber gel e û daxuya kirina şanoyên pêwendiyên nizim bi hindek ji – momiyayên- deselatê re mîna serketin û karpêkan , û diwem : xwesipartina Rastgeriya Kurdî li ser hindek girûp û şepêlên opozisyona ! Erebî û nişтimanî li Şamê û ew jî helbet opozisyoneke yan kedîkiriye û yanjî rêdankiriye û ew jî di warê nêrnînê xwe yên siyasî derabreyê şîrovekirina mafên Kurdî de ne dûrî deselatê ne vêce ew wisa bi pijirandin û pesinkirin û sipaskirin tê

pêşwazîkirin û bawernameya paqijiya niştimanî werdigire ku xwedê giravî Rastger tolerans û realit e û û û !?

Di baweriya min de , dergeh bi tevahî hîn nehtaine girtin di pêşiya prosesa lixwevegerê û vegerandina liv û lebatê berbi aliyê baş û positîv ve, nemaze piştî pijirandina pêwîstiya avakirina lêvegera neteweyî Kurdî di riya diyalog û lihevhatin û hevahengiya giştî derheqê xurtkirin û bihêzkirina rola rêxistinên hizbî di warê têkoşîna neteweyî û guherîna demokartîk de li ser asta welatperwerî . Sebaretî Çepgeriyê û girûpên din yên ku ji verêja rabûna Kurdî ya buhara sala 2004an bûn ; ew jî nayên lêborîn kirin derbarê berpirsiyariya wan ya mêjûyî di texsîrkirina wan de di warê jinûve avakirina rêxistinên xwe bi şêweyekî demokrasiyane û nûkirina xortaniya serkirdayetiyên xwe û pakkirina refên xwe ji fitnehezên ku rizqê xwe bi fitne û nakokiyan derdixin û pêşkêşkirina bernameya xwe ya xebatane ya saxlem û diyarkirina nêrnînên xwe yên siyasî û bikaranîna xwe- rexenkirin bi eşkerayî derbareyê aspêktên texsîrê yên pir û gihiştina vegerandina yekîtiya Çep ê neteweyî yê demokrat wekû rêbazeke dîrokiya ji enacama konferansa Tebaxa 1965an ji bo serdestiya xebatê bike manendî baskekî çalak di nav tevna tevgera demokratîxwaza neteweyiya Kurd de û pêkanîna erk û stûbariyên pêvajoyê mîna gavekê berbi çareserkirina qeyrana niha ve .

- Pêgirêdana we bi Markisiya-Lênînî ve li ku bidawî bû ?

- Pêgirêdana me bi perensîpên Sosiyalisma –Zanistî ve ji despêka salên 70î ji sedsala bûrî ve destpêkir di bin saya

rewş û barodoxên Kurdî û lokal û cîhanî ku bi van semyan û diyardeyan xuya dibûn : pêgirtina me bi wan hizr û ramanan ve nek jiber ku em nûnerên çîna karkeran e (Pirolîtariya) Kurdî yaxud weke partiyeke çînayetî yan rêxistineke Komûnist ku tê naskirin di bizava Komunistî ya navdewletî bûn , lê weke baskekî ji tevgera rizgarîxwaza netewî a Kurd ku meyildariya xwe ji Kampa Sosyalist re dikir ji ber perensîpên diyar û xuya ku ewjî evin : yekem , nêrîna Sosiyalismê derbarê pirsgirêka neteweyî û çareserkirina wê li ser bingeha morkirina mafê çarenûsî û diwem : nêrîna Rojava ya Koloniyalist û li dij Kurdan û mafên wan û nêrîna wan ji şoreşa Kurdî li İraqê û parastina rêjîmên ku Kurdistan dagîrkirine re, herweha serperiştiya Rojava ji tevahiya peyman û hevbendiyên ku bi rêjîmên diktator û şovonist re hatine morkirin li dijî demokrasî û mafên gelê Kurd û sêyem : kartêkirin bi tevger û bizavên Çepger yên milletên Ereb û Tirk û İranî re yên ku nêrîneke hindekî têgihştî derbarê mafên gelê Kurd yên rewa berevajî tevgerên Rastger yên netewî û İslamî li wan welatên navbirî de .

Çaremîn : bersivadana arezûya dewletên Sosiyalîst di pêşwazîkirina xwendekarên Kurd li zanîngeh û instûtên wan û xurtkirina prosesa lêkolîna zanistî derbarê dîroka gelê Kurd û wêjeya wî li ser bingeha arşîve wî yê têr û parastî li nik birêvebirên derve û instûtên dîrokê , ez na veşêrim ku me wê demê azweriya gihştina avakirina pêwendiyên bawerî û hevbendiyê bi dewletên Kampa Sosiyalîst re avakirin û qezenckirina piştgirî û piştevaniya wan di warên herêmî û navneteweyî de ji bo çareserkirina kêşeya Kurd û me karibû piştî hewildan û hevdîtinên ku bi salan dom kirin, em rengekî ji têgihştin û guhdanê bidest bixin ji layê endamine nêzîk ji cihên biryardanê , her weha

divê em venasînê bidin ku em di vê hewildana xwe ya rewa de rastî gelek astengiyan ji gelek deveran dihatin weke bîrokrasiya serdest li welatên Sosyalist yên caran û rêjîmên şovonist yên ku – pêşverû- û hevbend bûn di konevaniya wan dewletan de û partiyên Komunist yên alîgirê wan wekû rêjîma Bees li Sûriyê û Iraqa caran û hindek jîngehên bibandor di nav refên partiyên Komûnist li Îran û Tirkiyê û Sûriyê û İraqa caran û di pêşiya hemuyan de Komûnistên Kurd û şepêlên Rastger di nav tevgera netewî ya Kurd de .

Bingeh yaxud sedemên me yên navhatî li jor di warê pêgirtina bi Sosyalisma Lêninist re niha nemane : Sosiyalîsim wekû dewlet û wargeh (Kamp) û rola navneteweyî nemaye weke berê, û nêrîna Rojava ji kêşeya Kurdî hatiye guhertin û hew êdî ew- Rojava-mîna dijminekî têtе hijamrtin di acendên bizava netewî ya Kurdî de , û Çepger jî li welatên herêmê nema dixuyin di serê lîsetya hevalbendên tevgera Kurdî lê şepêlên lîberal û demokratîk yên nuh hatine xuya kirin tevî çûna hindek baskên Çepger yên klasîk berbi hizra totalîtera şovonîst ve yaxud Islama Siyasî ya bi piranî li dijî mafên gelê Kurd e, û dewletên Rojavayê jî destpêkirin pêşawzîkirina komên xwendekar û pisporên Kurd kirin bi armanca xwendin û meşeqkirin û amadkirin di tavilê pispor û zanistiyan de , her weha ew rê didin ku çalakiyên Kurdî yên siyasî û çandî li ser qada wan lidar bikevin **. Ev pêşveçûnên objektîv rastiya badnora perensîpên Markisîzmê û felsefeya wê li ser bûnyadgeriya me ya rewşenbîrî û rastiya wan û zanistiya wan di warê zanîn û analîzekirina civak û komelgehan û danûsitandin bi rasteqînên jiyanê re û guherandina wê , tune nakin bi**

hîç şêweyekî, lê ku ji me were xwestin, weke nimûne, ku em ala Komûnismê bilind bikin û heyfa wê hilînin û tola wê bistînin hingê ez dibêjim ku ev ne stûbariya me ye û nejî em dikarin wê pêkbînin ji ber ku bi kurtî me kelepûra sosyalist ne ji çavkaniya wê ya resen naskir, lê di riya wergerandinan û navçîtiya ku partiyên Komûnist li herêmê nûneriya wê dikirin û ew erk û stûbariya gotî ji wan tête xwestin di pileya yekemîn de eger ku gerek be jixwe û divê ji xelkê re şîrove bikin sedemên têkçûn û hilweşandin û rûxandinê û riyên jinûve avakirinê û wane û ibretên girtî .

- Pêwendiyên Erebî-Kurdî di çi radeyê de ne ? Di rewşeke çawa de dijîn ?

- Bê guman em hîn di qonaxa jinûve nêrîna li bingeha pêwendiyên Kurdî- Erebî û jinûve avakirina wan de ne ku ew li gor perensîpên morkirina mafê çarenivîsî û venasîna ji herdû layan û hevjana aştiyane û azadiya bijartinê û hevpişkiya adilane bin , û em bi hewceyî demê ne da ku tiştê em dixwazin pêkbînin wekû Ereb û Kurd jî û ez pêwîst dibînim bibêjim ku di van salên dawî de pêşveçûneke berfireh sebaretî pijirandina elitên Erebî yên ronakbîr û ramyarî nexasime di nav refên opozisyonên niştimanî de derbarê mafên gelê Kurd yên rewa de bi xwe re anîn . Di nêrîna min de , dem dema bêtir hevtêgihştin û hevpijirandinê ye di navbera faiiliyetên herdû milletan de nemaze em dibînin ku radeya cûdabîrî û jihevdûrketinê fireh dibe derheqê nêrîna ji doza Kurdî di navbera elîtên Erebî ji layekî ve û gotar û pratîkên rêjîmên deselatdar û serdest û bi taybetî li Sûriyê ,ji aliyê dîtir ve . Helbet , pir rê û rêçik hene ku dikarin nêrîn û dîtinên elitên herdû

gelan nêzîkî yektir bikin û ez dibînim ku qonaxa niha bi hewceyî xurtkirin û bilezkirina prosesa têkilbûna elitên siyasî û rewşenbîrî yên Kurdî di nav refên eniyên opozisyona niştimaniya demokratîk de ye, nexasime ya Sûrî tev li avakirina damûdezgehên hevbeş li ser astên niştimanî û herêmî weke – komelên dostaniyê – li gor nimûneya herdû komelên dostaniyê yên li Kurdistana İraqê û Filistinê û li hindek welatên din di demke nezîk de da ku bibin mîna pirên hevnaskirin û diyalog û danasîna rewşa hevûdu û kûrkirina dûrahiyên mêjûyî û çandî di jiyana herdû milletan de ,û guman tê de nîne ku naskirina elitên Erebî ji nêzîk û bi hûrî ji tecrûbeya demokratik ya Kurdistana İraqê dê, bi rengekî positîv bibe alîkar di bicihanîna armancên me de .

- Bi rêdana we em dê careke din vegerin mijara hevbendiya we bi birêz Ebdilhelîm Xeddam û Ixwan Mûsilmîn(Birayên Misilman) re di çarçeweya "Eniya Felata Niştimanî li Sûriyê" de , gelo ti sûde ji vî karê we heye ? Hun ciddî ne di vê gava xwe de ?

- Bi eşkerayî û raste rast ez dibêjim ku erê ez ne tenê ciddî me di vê mijarê de lê ez bi tundî û zorî jî ciddî me û gava min dide xuya kirin : yekem , asteya berz û bilind di warê diyaloga Kurdî- Erebî de li ser asta niştimanî û diwem , kartêkirina bi opozisyona demokratîk ya welatperwer re ya ku baweriyê bi karê bikom yê aştiyane tîne ji bo guherîn û çaksazî û jinûve avakirina Sûriyê . Min hevalbendiya herdû layan kir (Ixwan û Xeddam) li ser bingehên diyar li gor bernameyekî hûr liserê lihevkirî , ev herdû layên navhatî di mêjû de dûr û girtî bûn derbarê rastiya Kurdî ji ber ku partiya Bees ya deselatdar ew e

çavkaniya nexweşî û xwediya nêrînên nijadperestane û danera plana bierebkirin û Zinnara Erebî û koçkirinê ye , û Ixwan Misilmîn ti nerîneke siyasiya positîv derbarê doza Kurd nedan li dirêjahiya dîroka xwe de û nêrîna wan beriya du salan ne di asta xwestî de bû , an ku min hevbendî pêkanî bi nûnerên du zehmetirîn layan re nisbetî Kurdan (yek dijmin û yê dîtir ne haydar bû) piştî ku xwe ji nêrîna xwe ya berê vekişandin û bi mêrxasî û berpirsyariya nîştimanî û bi bawerî hebûna gelê Kurd li Sûriyê wekû neteweyeke sereke ya diwem û mafên wî yên siyasî û demokratîk û ciavkî û çandî û aborî û perensîpa hevpişkiya çarenivîsî di navbera Ereb û Kurdan de û çesipandina van mafan di destûrê Sûrî yê nû de û ji holê rakirina şop ên Zinnara Erebî û vegerandina mulkiyetên guhastî û neguhastî yên ku ji xwediyên wan hatine sitandin ji ber sedemên neteweyî û konevanî , pijirandin tev li pijirandina perensipa beşdariya nûneriya tevgera Kurdî bi nisbeta % 15 di tevahiya dezgehên Eniyê de û ewlebûna bi zimanê Kurdî li gel zimanê Erebî di belge û ragihandina Eniyê de û bi vê boneyê ez çalakîgêrên tevgera netewî ya Kurdî ya demokrat li her deverê û bi taybetî li derve ji bo palpşitî û piştgiriya Eniya Felata Nîştimanî bikin û têkilbûna nav refên wê bibin û danûsitandinê pê re bikin .

- Hun gorepana rewşenbîrî ya Kurdî li Sûriyê çawa rave dikin ?

- Gorepana me ya rewşenbîrî ya Kurdî ya piçûk tûşî guherîneke mezin tê û ew bersivdan e û pişikdariye di eynî demê de ji destnîşan û despêkên prosesa guhertinê ya xwestî li deverê tevî , ronakbîr û xwendevanên nifşê

nûhatî û ciwan yên ku tecrûbeya rabûna Avdarê ya pîroz bûrandine yan lê amadebûne ji beriya du salan dergehên siyaset û çand û dahêneriyê bi xurtî dikutin, û ev hem erk û hem mafê wan e û me her û her banga vî tiştî dikir jiber ku ji mafên wan e beşdarîkirina di danîna form û naveroka niha û ayindeyê û xweîspatkirin û avakirina kesayetiya welatperwerane û serpirştîkirina xebata neteweyî ya demokrasiyane û ez bi hêvî me ku ev tişt bibe alîkar di çareserkirina qeyrana ku roj bi roj mezin dibe di nav tevgera Kurdî de beramberî vê pêşveçûna gewre hîn jî hewildana veqetandina çanda neteweyî ji doza neteweyî lidar e û her carê bi gelek reng û texlîtan hindek vî karî dişopînin jiber ku dûrkirina ronakbîran ji karûbarê neteweyî û bizava siyasiya Kurdî projketeke deselatdarî ya kevin e ji bû valakirina tevgerê ji kesê herî giring an ku rewşenbîr û balîkirina yaxud kirêkirina hindekan ji wan li berjewendiya siyasetên deselata şovonist di demên şayiste de. Guman tê de nîn e ku di vî warî de hemahengiyek heye di navbera siyasetmedarê Rastger xwediyê konevaniya dûrkirina rewşenbîran û rewşenbîrê Rastger de yê ku xwe terxan kiriye ji bû bicihanîna projekta deselatê di vî biyavî de û ev tişt ne hewceyî vegotinekê ye ji ber her roj di realitê de tête xuya kirin . Hewiladana cudakirina siyasetmedar û rewşenbîr yaxud guherandina rolan di navbera heduyan de bi karîkatorî nexasime di warê neteweyî de nayê pijirandin û têkçûyî ye ji ber ku ew li dijî realitê ye û berevajî rojeva dîrokê ye û ew tenê bersiveke ji fermanên ku ji jor têne dan û bi taybetî ji layê berpirsên dosiya Kurdî û her weha siyasetmedar û rewşenbîr hev tewaw dikin di yek laşî de ku rastiya Kurdî bi herdu layên xwe temsîl dike .

Derbareyê livên şanoyî yên ku dem bi dem derdikevin holê û akter in nû dixuyin û hindek bikar tên ji bo bicihanîna hindek plan û tektikên taybet li berjewendiya konevaniyên rêjîmên zordest û sitemkar li hemberî bihêzbûna opozisyona nîştimaniya demokratîk û despêkên beşdariya Kurdî ya aktîv tê de , ew tev vedengeke ji derveyî dîrokê ye û parçeyeke ji prosesa birêvebirina qeyrana Kurdî ne çareserkirina wê û ez çavnebariya tu lîstikvanên din çi siyasî yaxud rewşnebîr nakim , û li hemebrî ve nizimbûnê ez hezkirina xwe bi hindek pênûsên ciddî û rêzdar naveşêrim di nav jîngeha rewşenbîriya Kurdî de li derve û hundir tevî ku hîn zû ye dana hûkmikî dawî derbarê wan yan eşkerekirina navê wan .

- Tê zanîn ku hun balanseke hûr û nasik di navbera (siyasetmedar û Rewşenbîr) de li dirêjahiya xebata xwe de dikin , hun çawa vê şîrove dikin ?

- Kartêkirin û têkilbûna rewşenbîr û siyasetmedar di tecrûbeya me de, vedigere bo sedemên dîrokî û objektîv û yekem sedem ew e : serdestiya şêwaza siyasiya aştiyane ji ber sedemên bingehîn û realit li ser forma xebata me ya netewî berevajî xebata parçeyên din, û diwem bandora perensîpên dibistana Bedirxanî û rêbaza tevgera –Xoybûn- li ser rojeva me ya hizrî û siyasî û çandî û tê zanîn derbarê wê dibistana navbirî de xwesipartina wê li ser têkoşîna siyasî û karê çandî di heman demê de , û sedemê sisêyan şopnadina şêwaza tevgera nîştimaniya Sûrî ya ku tê naskirin bi rengê aştiyane yê siyasî û çandî yê dûr ji tundûtûjî û şerê çekdarî, û çarem :wekû beşek ji tevgera rizagrîxwaza neteweyî ku tûşî operasiyonên bierebkirin û

koçkirinê tê ,em pir bi hewceyî kedeke çandî bûn ji bo tekezkirina nasnameya me û parastina zimanê me yê zikmakî û pêşîlêgirtina rikeberiyên pişaftina neteweyî û guherandina pêkhateya neteweyî û civakî ya deverên Kurdî û adrêskirina nifşê nû ta ku nekeve bin bandora siyasetên ku reiletê wan pêşkêş dike û xwe li ber pêlên şovonist yên har xûz neke .

Ji ber wisa em alîgirên vejandina çanda Kurdî bûn hember biveya tunekirina wê û weke nimûe yek ji şertên endamtiya partiyê fêrbûna alifbeya Kurdî bû, me gelek vekolîn û xwendin û raporên siyasî belav kirin hinde ku me rêbazeke nû di şêwaza tevgera Kurdî de peyde kir sebaretî çanda siyasî û neteweyî di riya kovar û belavokên mehane bi herdû zimanên Kurdî û Erebî , her weha me di despêka têkoşîna xwe de –Kombenda Kawa bo Çanda Kurdî – damizrand li ser riya Xoybûnê di warê berhema wê ya çandî ya pir de "ne rasthatin e ku Kombend kovareke hizrî rewşenbîrî bi nave Hawara Nû derdixe ." û me erkê vejandin û parastina tiştê li ber pişaftinê bû di dîrok û mêjûya me de û jinûve çapkirina wan û belavkirina wan nexasime bi zimanê Erebî ji bû danasandina milletê Ereb yê dost bi rastiya doza Kurdî û rabirdû û niha û çanda Kurdî , girte ser milê xwe . Ewlebûna me ya bihtir di vî warî de ser erşiva Sovetî ya dewlemend bû li gel xwequrbankirina me di xebata me ya neteweyî û nîştimanî de bi şêweyê herî baş di riya karekî siyasî ciddî dagirtî bi çanda neteweyî demokratîk a vekirî ku tukes inkar nake .

- Çi ne, li gor we , asoyên tevgera rizgarîxwaza neteweyî Kurdistanî li deverê û paşeroja wê , bi kurtî eger hun bêjin ?

- Bi giştî, hêjî tevgera Kurdistanî tê jimartin ji tevgerên rizgarîxwaz yên neteweyî ku xebateke pirreng dike ji bû morkirina mafê çarenûsî bi forma ku Kurd dixwazin û niha tevger berbi qonaxeke nuh ve diçe piştî pêçveçûnên mezin li ser astên herêmî û navdweletî û divê ew danûstandinê bi bûyerên nû re bike bi nermahî û zîrekî ku berî hertiştî hewcedarî pêkanîna guherînan di fakterên objektîv û sebjektîv an ku di serkirdayetî û bername û alavan de ta ku em ji guherînên xurt û bilez nemînin yaxud tevger dê derfetên mêjûyî yên mayî ji dest bide .

Çend fakterên stratîcî yên nû peyde bûne vê dawiyê û bandoreke positîv li ser rewşa Kurdî hiştin mîna rûxandina rêjîma diktator û şovonî ya Iraqê û vejîna tevgera Kurdî li wir û çalakiya wê ya aktîvane di prosesa siyasiya İraqê û tecrûbeya demokratîka federe de li Kurdistanê di nav de biserketina çareseriya federe ji bû doza Kurd weke tecrûbeyeke nimûneyî ,ev tev dihêlin ku herêma Kurdistanê berbijarê serpereştîkirina navenda berxweve anîna siyasî û neteweyî ji bo tevgera netewî ya rizgarîxwaza Kurdî li herême be ku wane û ibretan jê werbigire û piştgirî û piştevaniyê jê bibîn in . Di vî biyavî de gelek ji birayên me yên mezin tê hêvîkirin di ji projekt û mûbadereyan û bernemyên kar û pêşkêşkirinên taybet di warên karê rewşenbîrî yê hevbeş û siyaseta neteweyî û pirsgirêkên civakî de, û diwem : guherînên kûr di siyaseta nevdewletî de li berjewendiya dozên azadiya milletan û maytêkirina mirovî û mafên mirovan û piştevaniya

prosesên demokratîk û cenga cîhanî li dijî terora fundemêntal ya ayînî û neteweyî û parçekirina kiyanatên avakirî li ser pêvekirina kotekî û şovonisma neteweya serdest û guhnedana yê dîtir û jinûve avakirina wan li ser bingeha dad û azadî û yekîtiya lihevkirî di navbera pêkhatiyên nişţimanî de, û sêyemîn: şiyarbûneke hêzên opozisyona demokrat di dewletên ku Kurd li wan hatine dabeşkirin û vekirina wan li ser tevgera neteweyî Kurd û avakirina hevbendiyên nû di çarçeweya enî û dezgene ku kar dikin ji bo guherînê di bin saya bernameyên nişţimanî ku bersiva hindek mafên Kurdî yên rewa didin, û çaremîn: rast e ku rêjîmên deselatdar li welatên ku Kurdistan parve kirine (ji bilî Iarqa nû) zorbaz û dîktator û şovonîst in ,lê ew qels û kiz û lawaz in jî û di tirsa ji gelê xwe û ji komelgeha navneteweyî de ne û dê werin guhertin zû yan dereng .

Helbet wek ku me got rewşeke objektîv ya şayiste heye da ku tevgera rizgarîxwaza netewî ya Kurdistanî berve pêş here û pir erkan pêkbîne, lê ew di realitê de rastî astengiyên fakterê sebjektîv yê qels û lawaz ku di du şertên ne pêkhatî de dixuyin, tê : Bernamyê şayiste û serkirdayetiya demokarata hêja .

- Dawî -